


## Do cewabê xo bi xurtî bigîro

PAJK hêrişê Tirkiye yê hemverê Mexmûr, Şengal û Rojava şermezar kerd û va: "Rejimo faşist do bi hawayêkê tewr xurtî cewabê nê hêrişan bigiro."... RÛPEL - 5



# Êrîş li dijî hemû kurdan e

### LI DIJÎ FAŞÎZMÊ BERXWEDAN

- Dewleta tirk bi balafirên şer li Mexmûrê zarokek jî di nav de 4 penaberên jin qetil kirin û gefên dagirkeriyê li rojavayê Kurdistanê dixwe. Hevseroktiya Konseya Rêveber a KCK'ê got Tirkiye ji bo ku faşîzma xwe li ser pêyan bihêle, êrîşî Mexmûr, Şengal û Rojava kiriye û banga geşkirina berxwedanê ya li dijî faşîzmê kir

### DEMA YEKITIYA NETEWEYÎ YE

- Welatiyên başûrê Kurdistanê jî bertek nîşanî êrîşa dewleta tirk dan û gotin ku divê kurd li hemberî êrîşan bibin yek. Endamên Tevgera Azadî û Malbatên Şehîdan jî nerazîbûn nîşanî êrîşên dewleta tirk dan û wiha gotin: "Êrîşên hewayî yên li dijî Mexmûr û Şengalê li dijî hemû gelê kurd in."... RÛPEL - 3

@rojname

16 Kanûn - Yekşem 2018 E-mail: e-rojname@hotmail.com Hejmar: 206

## Polîtîkaya kurd-kuj a dewletê



Feraseta kurd-kuj ji avakirina Komara Tirkiyeyê ve li ser kar e û heta niha li Kurdistanê bi sedan komkujî pêk anîne. Ne tenê li bakurê Kurdistanê li çar parçayên Kurdistan û li Ewropayê jî kurdan hedef digirin. Di doza Licê de kesên ku Bahtiyar Aydin kuştin ji aliyê daraza tirk ve hatin beraetkirin û kesên bêsûc 22 sal in girtî ne... RÛPEL - 6

# Greva birçîbûnê ket qonexeke nû

### DI ROJA 39'EMÎN DE YE

Hevseroka KCD'ê û parlamentera HDP'ê ya Colemêrgê Leyla Guven ji bo tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan were rakirin 39 roj in di girtîgeha Tîpa E ya Amedê de ketiye greva birçîbûnê ya bêdem û bêdorveger. Piştgiriya ji bo berxwedana greva birçîbûnê jî zêde dibe.

### JI GIRTIYAN BIRYARA NÛ

Li ser navê girtiyên ji doza PKK û PAJK'ê Denîz Kaya daxuyaniyek da û diyar kir ku ji bo tecrîda li ser Ocalan were rakirin dê ji îro û pê ve ji girtîgehên Tîpa E û D ya Amedê, Gebze, Kandira, Wan û Patnosê dê 30 girtî dest bi greva birçîbûnê ya bêdem û bêdorveger bikin.

### LI AMÛDÊ 450 KES

Li navçeya Amûdê ya Qamişloyê 450 kes ji bo piştgiriyê bidin Leyla Guven û tecrîda li ser Ocalan şermezar bikin ketin greva birçîbûnê. Endama Koordînasyona KJK'ê Rewşen Mêrdîn bal kişand ser girîngiya greva birçîbûnê û anî ziman ku divê hemû jin li çalakiyê xwedî derkevin... RÛPEL - 2/3



### HILBIJARTIN

## Bila neyên deng ji gel nexwazin

Hevseroka HDP'ê Pervîn Buldan li Colemêrgê çû serdana gel û wiha got: "We tu demê dev ji rêgezên xwe bernedan û her tim hûn ji bo ziman û çanda xwe têkoşiyan. Kesên ku vîna gelê Colemêrgê dîl girtine bila neyên ji gelê Colemêrgê dengan nexwazin."




RÛPEL/ 3

### ABORÎ

## Jinan qeyrana aboriyê nîqaş kir

Hewldana Îstîhdam û Keda Jinê (KEIG) forûma 'Qeyran, Jin û Keda Jinê' li Salona Konferansê ya Kampusa Bomontî ya Zanîngeha Mîmar Sînan li dar xist. Ji gelek saziyan jin beşarî forûmê bûn. Di forûmê de mijara aboriyê hat nîqaşkirin...



RÛPEL/2



## KESK seba mîtîngî veng da

Konfederasyonê Sendîkaya Kedkaranê Rayapêroyî (KESK) hemverê krîzê ekonomî, betalî û binpaykerdişan de bi siloganê 'Bedêlê krîzî kedkar nê, wa kesî ke bîyî sebeb bidî' do 16ê kanûne de Raşteyê Îstasyonî yê Amedî de mîting pê bîyaro. Ciniyê KESKî seba terbiyayîşê mîtîngî veng dayî. bîyaro. Ciniyî qiseykerdişê xo de wina vatî: "Mîting bi ortaxiya DÎSK, TMMOB, TTB û rêxistinê ked û pîşeyî do pê bêro."... RÛPEL - 5




## Dayikên Şemiyê 716 hefte ne edaletê dixwazin

Dayikên Şemiyê di hefteya 716'emîn de xwestin çalakiya xwe li Qada Galatasarayê li dar bixin, lê polîsan destûr neda. Li ser vê yekê dayikan li ber avahiya ÎHD'a Stenbolê çalakiya xwe pêk anî. Vê hefteyê ji bo Îbrahîm Demîr ê 36 salî û Agît Akîpa yê 39 salî yên di sala 1991'an de li Hezexa Şirnexê di bin çavan de hatin kuştin û dûre cenazeyê wan hat dîtin, daxwaza edelatê hat kirin... RÛPEL - 3

## Bêîxmalîya Barajê Dîcle

Badê ke qezaya Gêl ya Amedî de qapaxêko Barajê Dîcle şikîya awa Çemê Dîcle 6 metreyan berz bî. Hedîse ra dima xeylê Baxçeyê Hevselî û erdê berardişî binê ame de mendî. Sewbîna tay cayan de awe resa heta keyeyanê hemwelatîyan û dormeyê Pirê Des Berî yê Amedî de kargehî binê awe de mendî... RÛPEL - 5



### CÎHAN

## Li Yemenê şer û pevçûn didomin

Hate îdiakirin tevî ku agirbesta li Swêdê ya ji bo bidawîkirina şerê navxweyî yê li Yemenê, şerê li bajarê Hûdeydayê jî nû ve dest pê kir. Di navbera milîsên Hûsî yên Rabdû Mansûr Hadî û hêzên hikûmetê de dem dem şer diqewime...



RÛPEL/4



## Mûrad: Iraq û Herêma Kurdistanê em neparastin

**ŞENGAL -** Nadiya Mûrad ku di 10'ê Kanûnê Roja Mafên Mirovan a Cîhanê de Xelata Aştiyê ya Nobelê wergirt, serdana Şengalê kir. Mûrad destpêkê çû Kampa Serdeşt û malbatên li kampê ziyaret kir û piştre jî derbasî gundê Koço ku lê jidayik bûye û di fermanê de çeteyên DAIŞ'ê lê komkujî pêk anîbûn, bû. Ji wir jî derbasî navçeya Sinûnê bû. Mûrad li vir ji gelê êzidî re axivî û got ku ew bi jinên êzidî serbilind e ku tevî evqas zehmetiyan jî li ber xwe didin. Her wiha Mûrad qala serdana xwe ya Iraq û Herêma Kurdistanê jî kir û wiha got: "Me vekirî ji wan re got ku we di dema fermanê de gelê me neparast. Me ji hikûmeta Iraqê xwest ku hêzên li Şengalê bên fermîkirin û alîkarî bê dayîn."

# Divê jin li çalakiya Guven xwedî derkevin

**Endama Koordînasyona KJK'ê Rewşen Mêrdîn têkildarî greva birçîbûna ya Leyla Guven ku ev 39 roj in li dijî tecrîdê di greva birçîbûnê de ye, axivî û diyar kir ku daxwaza Guven daxwaza hemû jin û gelan e, ji ber vê yekê divê jin xwedî li çalakiya Guven derkevin û pêşengiyê bidin çalakiya wê**





Endama Koordînasyona KJK'ê Rewşen Mêrdîn di Stêrk TV'ê de ji Rojeva jinê re axivî. Mêrdîn têkildarî greva birçîbûnê ya ku bi pêşengiya hevseroka KCD'ê Leyla Guven a li dijî tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan hatiye despêkirin, li ser gef û êrîşên dewleta tirk ên li ser rojavayê Kurdistanê axivî.

Mêrdîn got jin azadiya xwe di azadiya Ocalan de dibînin, daxwaza Guven daxwaza hemû jin û gelan e û divê hemû jin xwedî li çalakiya greva birçîbûnê ya Guven derbikevin.

Mêrdîn di destpêka axaftina xwe de çalakiya Guven silav kir û da zanîn ku tecrîda li ser Ocalan her diçe girantir dibe û wiha got: "Leyla Guven û gelek kes ev hîs kirin. Çalakiya Leyla Guven çalakiyeke şoreşgerî ye û ji bo mirovahiyê ye. Yê ku di nav çar diwaran de tê girtin îradeya gelê kurd û hemû gelan e, îradeya jinan e. Êdî li cîhanê gelek kes Rêber Apo weke rêberê xwe dibînin. Azadiya xwe di felsefeya Rêber Apo de dibînin. Dijmin jî ji bo vê tecrîd li ser Rêber Apo girantir dike. Projeya Rêber Apo ji bo azadiya jinan hebû. Birêz Leyla ji bo ku xwedî vê projeya Rêbertî derkeve ket çalakiya greva birçibûnê. Em jin azadiya xwe bi azadiya Rêber Apo ve girê didin. Rêber Apo em kirin xwedî nasname, jin kir xwedî rêxistinî, hişt ku jin bi rengê xwe, sirûşta xwe tev li jiyanê bibe."

**Daxwaza Guven daxwaza jinan e**

Di axaftina xwe de Mêrdîn da zanîn ku çalakiya Guven ketiye roja 39'an û got ku daxwaza Guven daxwaza hemû jin û gelan e, ji ber vê divê jin xwedî li çalakiya Guven derkevin û wiha domand: "Me bi berxwedanê hebûna xwe îspat kiriye. Ev çandeke me ya rêxistinê ye. Ger em xwe bi rêxistin nekin, li ber xwe nedin, helwesta xwe bilind nekin, dijminên kurdan û jinan derfetê bibînin. Dewlet herî zêde ji jinan ditirsin. Ji ber ku herî zêde jin li ber xwe didin."

Mêrdîn ragihan de Guven pêşengtiyê ji çalakiyên greva birçîbûnê re dikin, bi taybetî jin gelek kes ji piştgiriyê didin û wiha pê de çû: "Ji ber ku Leyla biheq e, azadiya Rêberê Gelan Abdullah Ocalan, azadiya temsîla mirovahiyê dixwaze, gelek kes destekê didin Leyla Guven. Em hemû jin neçar in ku weke Leyla Guven pêşengiyê bikin û têkoşîna xwe bilindtir bikin."

**'Dema netewe-dewletan êdî qediya'**

Her wiha di axaftina xwe de Mêrdîn bal kişand ser êrîş û gefên dewleta tirk a li ser Rojava û diyar kir ku êdî netewe-dewlet ber bi tunebûnê ve diçin, li rojavayê Kurdistanê jî wek alternatîfa netewe-demokratîk pêk tê, ji ber vê yekê hemû hêzên hegemonîk pergala li Rojava ji bo berjewendiyên xwe wek tehtîd dibînin û axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Demên netewe-dewletan qediya. Êdî dem dema pergala neteweya demokratîk û konfederal e. Pêwistiya cîhanê bi pergaleke demokratîk heye. Tecrubeyeke rojavayê Kurdistanê heye. Divê tu kes pişta xwe nede hêzên derve. Divê kurd bibin yek, em besî xwe ne. Em ê li hember êrîşên netewe-dewletan têkoşîna xwe bilindtir bikin." *BEHDÎNAN*

# 'Em ê serî li dijî gef û êrîşên Erdogan netewînin'

Di 13'yê kanûnê de ji aliyê dewleta tirk ve di saetên bi şev de Wargeha Mexmûrê (Şehîd Rustem Cûdî) bi balafirên şer hat bombebarankirin û di encama êrîşê de 4 jin hatin qetilkirin.

Der barê êrîşên dewleta tirk de jinên Mexmûrê diyar kirin ku li dijî hemû zilm û zordestiyê dê li ber xwe bidin.

Hevseroka Wargeha Mexmûrê Fîlîz Bûdak diyar kir ku gelê Mexmûrê li dijî zordestiyê têkoşîna xwe didomînin û wiha got: "Di 6'ê Kanûna 2017'an de dîsa li dijî Hêzên Parastina Cewherî yên Wargeha Mexmûrê êrîş ji aliyê dewleta tirk ve pêk hatibû. Ev êrîşa ku hat kirin jî wekî wê êrîşek plankirî bû. Ev êrîşana konsepta şerê tunekirina gelê kurd e. Dewleta Iraqê jî divê li dijî vê yekê bêdeng nemîne. 25 sal in gelê Mexmûrê li dijî polîtîkayên dagirker li ber xwe didin. Her dem dagirkeran xwestine ku Wargeha Mexmûrê belav bikin. Lê gelê Mexmûrê her dem di asta herî bilind de têkoşîna xwe daye meşandin. Ji îro pê de jî dê bidin meşandin. Her ku ew êrîş dikin em bi hêztir dibin. Em wekî gelê Mexmûrê bi şehîdên xwe serbilind in û em ê heta dawî rêça wan bişopînin."

Di axaftina xwe de Bûdak da zanîn ku ev êrîşa konsepta şerê tunekirina gelê kurd e û axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Li ser her çar parçeyên Kurdistanê êrîş hene. Dewleta tirk ji bêdengiya hêzên navneteweyî sûdê digire û êrîş dike. Divê ev bêdengî bi dawî bibe û li dijî dewleta tirk helwestek zelal bê nîşandan. Her dem êrîş li ser kurdan tê kirin û ev yek bi kompoloya navneteweyî ya li ser Rêber Apo ve girêdayî ye. Gelê Mexmûrê li dijî êrîşan bi hêrs in û ji her demê zêdetir li ser lingan e."

Her wiha jina bi navê Xatûn Demîr jî bertek nîşanî êrîşan da û diyar kir ku divê hemû kurd bidin yek û li dijî van êrîşan bisekinin. *MEXMÛR*



## TJA: Bêdengiya NY'ê nayê qebûlkirin

Tevgera Jinên Azad (TJA) têkildarî êrîşa dewleta tirk a li ser Mexmûrê û qetilkirina 3 jin û zarokek daxuyaniyeke nivîskî weşand û da zanîn ku bi êrîşan îradeya hemû gelên Rojhilata Navîn hedef hatiye girtin.

TJA'yê destnîşan kir ku tifaqa AKP-MHP'ê bi nêzikbûna hilbjartinên herêmî re dîsa konsepta şer xistiye meriyetê û ev tişt vegot: "Ev êrîş dijminatiya li dijî kurdan nîşan dide. Bi van êrîşana diyar dibe ku tifaqa AKP-MHP'ê çiqas ji jinan ditirsin. Li dijî êrîşên li ser Wargeha Mexmûrê bêdengiya NY'ê nayê qebûlkirin. Em bang li NY, saziyên neteweyî û navneteweyî, hêzên demokratîk, rêxistinên civakî yên sivîl dikin ku li dijî van êrîşan dengên xwe bilind bikin." *AMED*

# Jinan qeyrana aboriyê nîqaş kir

Hewldana Îstîhdam û Keda Jinê (KEIG) forma 'Qeyran, Jin û Keda Jinê' li Salona Konferansê ya Kampusa Bomontî ya Zanîngeha Mîmar Sînanê li dar xistin. Ji gelek saziyan jin beşarî forûmê bûn. Di forûmê de Aborîzan ên Femînîst Ozge Îzdeş û Yelda Yucel mijarên der barê aboriyê de pêşkêş kirin.

Yelda Yucel diyar kir ku li Tirkiyeyê ji bo encamên qeyrana aboriyê divê tecrûbeyên welatên din bên şopandin û wiha got: "Li gelek welatan, kêm jî be mînakên baş hene. Mînak li hin welatan destpêkê jin û kesên rastî bêmafiyan hatin, girtin kar. Karê wekhev, mûçeyê wekhev, piştî qeyranê hat esas girtin."

Ozge Îzdeş jî da zanîn ku êdî qadên îstîhdamê ji bo karkerên zilam jî kêm bûye û ev tişt anî ziman: "Windabûna hêza kar a zilam, bû sedem ku hêza jinê ya kar zêdetir winda bibe. Di vê qeyranê de piyaseya hêza kar xerab dibe. Di serdema qeyranan de hêza jinan a kar pir kêm dibe."



Dûre jinên beşdarî forûmê bûn bi awayekî komî nîqaş bi rê ve birin. Piştî xebatên komî yên nîqaşan, axaftina girtinê ya forûmê hat kirin û forûm bi dawî bû. *STENBOL*

# Star FM dê xwe bigihîne hemû bajarên herêma Cizîrê

Radyoya Star FM bi slogana 'Dengê jin û jiyanê' di sala 2018'an de der barê nûnertiya jinan, pêşketina bername û kadroyên kar de gavên girîng avêtin û hewl dide di sala nû de li tevahiya herêma Cizîrê weşanê bike.

Radyo beriya salekê li navçeya Tirbespiyê ji aliyê komeke rojnamevanan ve hate vekirin û 10 jin di radyoyê de dixebitin. Star FM ji saet 07.00'ê sibehê heta 08.00'ê êvarê bi zimanên kurdî, erebî û suryanî weşanê dike û bernameyên çandî, siyasî, civakî û dîrokî diweşîne. Her wiha bernameyên pêşbirkan jî hene. Radyo li ser rola jinan di civakê de û destkeftiyên ku di şoreşa bakurê Sûriyeyê de hatine bidestxistin disekine.





Têkildarî salvegera Star FM'ê ya Qamişloyê rêveberên radyoyê axivîn û gotin ku tevî hemû zehmetiyan me hewl da ku dengê jinan bi cîhanê bidin bihîstin.

Rêveber Hêvî Xelef anî ziman ku armanca wan ew e ku rastiya jinan derxin holê. Xelef bal kişand ser astengiyên ku di destpêka vekirina radyoyê de jiyane û diyar kir ku piştî salekê ji vekirina radyoyê û xebatê, wan karî xwe bigihînin hemû şêniyên herêmê û wiha got: "Heta astekê em gihiştin armanca xwe ya belavkirina azadiya jinan û pênasekirina rola wan a di civakê de."

Rêveber Solîn Serhan jî ev tişt anî ziman: "Vekirina radyoyeke taybet a jinan ji bo belavkirina girîngî û rola jinan di civakê de ye û ew jî gaveke sereke ji bo azadiya jinan e."

Her wiha nûçegihana radyoyê Mîdya Silêman jî diyar kir ku rojane 15 bername û nûçe bi zimanên kurdî, erebî û suryanî û çalakiyên ku li herêmê dibin, diweşînin. *QAMIŞLO*

# 30 girtî dest bi greva bêdem û bêdorveger dikin

Li ser navê girtiyên PKK û PAJK'î Denîz Kaya nameyek şand û ragihand ku ji bo rakirina tecrîda li ser Ocalan dê bi tevlêbûna 30 girtiyên ji doza PKK û PAJK'ê dest bi greva birçîbûnê ya bêdem û bêdorveger bikin. Kaya bang li hemû derdorên demokrat, rewşenbîr, hunermend û akademîsyen kir ku li dijî rejîma Erdogan tev li berxwedana wan bibin

NAVENDA NÛÇEYAN

Girtiyên ji doza PKK û PAJK'ê yên li girtîgehên bakurê Kurdistanê û Tirkiyeyê, bi armanca şikandina tecrîda girankirî ya li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, di 27'ê mijdarê di roja damezirandina PKK'ê de dest bi çalakiya greva birçîbûnê ya bêdem û dorveger a 10 rojan kiribûn. Di vê çarçoveyê de li 117 girtîgehan, zêdetirî 600 girtî ketibûn greva birçîbûnê. Têkildarî mijarê li ser navê girtiyên ji doza PKK û PAJK'ê, Denîz Kaya nameyek şand û da zanîn ku dê îro bi tevlêbûna 30 girtiyan, dest bi greva birçîbûnê ya bêdem û bêdorveger bikin.

**Nameya Denîz Kaya wiha ye:**

"Em têkoşîna sala 41'emîn a partiya me PKK'ê ku hemû xweşikahiyan di hundirê xwe de dihewîne, ji bo pêkanîna jiyaneke wekhev û azadiyê, weke salekê ku bi tempoyeke mezin û bi têkoşînê dagirtî dibînin. Di sala 41'emîn a têkoşîna partiya me de, em hemû şehîdên xwe yên leheng ku di dîroka têkoşîna me de ji bo dîtina armanca jiyanê û jiyana bi wê armancê berdêlên giran dan, bi rêzdarî û bi minet bi bîr tînin.

Ji bo ku em bikaribin layiqî ked û tevgera bîrdozî û paradîgmayî ya Rêber Apo ku partiya me PKK a mîna rûbareke bi coş mezin dibe civakî kir û li wate û rasteqîniya jiyanê bi cih kir, em xwe pak dikin û dibêjin ku dê berxwedana xwe mezin bikin. Di vê çarçoveyê de heta ku em tecrîda girankirî ya ku faşîzma qirker li ser Rêbertiya me ferz dike dişikînin, dê dev ji vê berxwedanê bernedin.

Li hemberî îşkenceya ku faşîzma qirker a AKP-MHP'ê li ser gelan ferz dike, li ku derê dibe bila bibe em ê li ber xwe bidin. Her çiqas rejîma dîktayê hewl bide çalakiya gelên me yên ku tecrîdê red dikin û xwedî li Rêbertiya me derdikevin bitepisîne jî, dê nekare bi ser bikeve. Dixwazin gelê kurd ên ku li derve ji bo şikandina tecrîda li ser Rêber Apo ketine greva birçîbûnê; bi serdagirtin, binçavkirin û girtinan bişikînin. Lê ev hewldan dê bênemcam bimînin. Em weke girtiyên ji doza PKK û PAJK'ê yên li girtîgehên Kurdistan û Tirkiyeyê, radigihînin ku em çalakiya greva birçîbûnê ya bêdem û dorveger a di 27'ê mijdarê de hatibû destpêkirin, mezintir dikin. Em weke girtiyên PKK û PAJK'î, ji bo şikandina tecrîda girankirî ya li ser Rêbertiya me, heta ku em digihîjin armanca xwe dê çalakiya xwe ya greva birçîbûnê ya bêdem û bêdorveger bidomînin.

Di vê çarçoveyê de, dê di 16'ê kanûnê de li Girtîgeha Tîpa D ya Amedê, Girtîgeha Tîpa E ya Amedê û girtîgehên Gebze, Kandira, Girtîgeha bi Ewlehiya Bilind a Wanê û li Girtîgeha Panos a Agiriyê 30 hevalên me dest bi çalakiya greva birçîbûnê ya bêdem û bêdorveger bikin. Heta ku tecrîd tê şikandin jî dê her 10 rojan carekî bi tevlêbûna girtîgehên cuda, çalakiya me ya greva birçîbûnê ya bêdem û dorveger bidome. Tekane rojeva me, şikandina tecrîda girankirî ya li ser Rêberê me ye. Di vê çarçoveyê de em bang li hemû derdorên demokratîk, li rewşenbîr, akademîsyen, nivîskar, hunermend û parêzvanên demokrasiyê dikin ku xwedî li berxwedana me ya bi rûmet derkevin û vedixwînin berxwedana li dijî rejîma Erdogan."



# Li Amûdê 450 kesan dest bi greva birçîbûnê kir

Çalakiyên kurd û kurdistaniyên li derveyî welat ên li dijî tecrîda li ser Ocalan bi çalakiyên cur bi cur didomin.

Kurdên paytex Moskovê ya Rûsyayê li dijî tecrîdê bi daxuyaniyekê dest bi greva birçîbûnê kirin. Di daxuyaniyê de ji bo bidawîkirina tecrîdê bang li CPT û NY'ê hat kirin. Her wiha di daxuyaniyê de êrîşa dewleta tirk a li ser Mexmûr û Şengalê jî hat şermezar kirin.

Kurdistaniyên li paytex Berlînê ya Almanyayê jî bi sernavê 'Berxwedana Îmraliyê' panalek pêk anîn. Çalakvanên greva birçîbûnê jî tev li panelê bûn. Di panelê de hat gotin ku azadiya Ocalan ji bo Kurdistan û Rojhilata Navîn girîng e, ji bo vê yekê divê demildest serbest bê berdan.

Çalakiyên greva birçîbûnê yên ku ji bo rakirina tecrîda li ser Ocalan, li bajarên Marsîlyaya Fransayê û Berna Swîsreyê ku hatibû destpêkirin, di roja 10'emîn de didome. Çalakvanan destnîşan kir ku heta tecrîda li ser Ocalan rabe û Ocalan azad bibe dê çalakiya xwe bidomînin.

Çalakiyên greva birçîbûnê li bajarên Rojava û bakurên Sûriyeyê jî didomin. Di çarçoveya van çalakiyan de bi pêşengiya Kongreya Starê li navçeya Amûdê ya girêdayê kantona Qamişloyê bi dirûşma 'Em ê tecrîdê bişikînin û bi serokê xwe re azad bijîn' 450 kes dest bi çalakiya greva birçîbûnê ya sê rojan kir.

Her wiha çalakiya greva birçîbûn yên li avahiya HDP'ê ya Hewlêrê jî hatiye destpêkirin didomin. Akademîsyen û nûnerên partiyên siyasî yên li herêma Behdînanê ji bo piştgirîdayînê çûn serdanan çalakvanan û di serdanê de bal kişandin ser êrîşa dewleta tirk û gotin ku bersivdayîna herî baş pêkanîna yekitiya neteweyî ye. *AMED*





## Bi dehan rêxistinên kurdan li dijî biryara DYA'yê li hev civiyan

Li hemberî biryara DYA'yê ya li dijî sê rêveberên PKK'ê Cemîl Bayik, Mûrat Karayilan û Dûran Kalkan nûnerên 81 partî, sazî û rêxistinên Kurdistanê bi pêşengiya Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê (KNK) li Bruksela paytexta Belçîkayê civiyan. Ji her çar parçeyên Kurdistanê ji xeynî PDK'ê hema bibêje hemû partî û rêxistin tev li civînê bûn.

Endamê Konseya Rêveber a KNK'ê Zubeyîr Aydar di axaftina destpêkê de got ku biryara DYA'yê ya di 6'ê Mijdarê de biryareke neheq e. Aydar diyar kir ku piştî gefên Erdogan ên li dijî Rojava, êrîşî Mexmûr û Şengalê hatiye kirin û diyar kir ku divê destkeftiyên Rojava werin parastin.

Piştre hevserokê KNK'ê Rêbwar Reşîd axivî û anî ziman ku ji nav sê pêşengên PKK'ê yên ku DYA'yê li dijî wan biryar daye, ji wan 2 kes endamên KNK'ê ne. Reşîd êrîşên li ser Mexmûr û Şengalê şermezar kirin û got ku rejîma Tirkiyeyê di warê leşkerî û siyasî de di rewşeke xerab de ye.

Hevserokê Kongra-Gel Remzî Kartal jî diyar kir ku divê peyameke hevpar ji DYA'yê re were şandin. Kartal li ser êrîşa dewleta dewleta tirk jî ev tişt vegot: "Em bêdengiya NY'ê ya li hemberî êrîşên li dijî Mexmûrê şermezar dikin. Li pêş çavên cîhanê êrîşî Kurdistanê tê kirin. Ev bêdengî rewşeke giran e. Ev êrîş bi tifaqekê hatiye kirin. Ev ne bazareke nû ye, 100 sal in li ser kurdan ev bazar tê kirin. Divê êdî kurd vê bazara qirêj bi dawî bikin û divê kurd dengê xwe bikin yek."

**Dê sibê dest bi grevê bikin**

Hevserokê KCDK-E'yê Yuksel Koç jî biryara DYA'yê şermezar kir û got ku ev biryar tê wateya nûkirina komploya navneteweyî. Her wiha Koç bal kişand ser tecrîdê jî û ev tişt anî ziman: "3 sal in agahî nayên stendin. Em ji bo şikandina tecrîdê têdikoşin. Greva birçîbûnê ya Leyla Guven di roja 39'emîn de ye. Em ê jî bi heyeteke ji 18 kesan, roja Duşemê li Strasboûrgê dest bi greva birçîbûnê ya bêdawî û bêdorveger bikin. Em bang dikin ku bila gelê me û dostên me, piştgiriyê bidin vê çalakiyê." *BRUKSEL*

# Li dijî êrîşan banga geşkirina berxwedanê

Gelek sazî û partiyên kurd li dijî êrîşa dewleta tirk a li ser Mexmûr û Şengalê daxuyaniyên nivîskî weşandin. Her wiha êrîş li gelek bajarên Ewropayê jî hat şermezarkirin.

Hevserokatiya Konseya Rêveber a KCK'ê di daxuyaniya xwe de diyar kir ku di demên dawîn de zêdebûna gefên êrîşan, êrîşên li ser Mexmûr û Şengalê bi maneyeke taybet in û got ku Tirkiye ji bo ku faşîzma xwe li ser pêyan bihêle tim dixwaze Sûriye di nav şer de bimîne. Di daxuyaniya xwe de KCK'ê ragihand ku dewleta tirk tiştên ku DAIŞ temam nekiriye dixwaze temam bike û diyar kir ku dê gelê Şengal û Mexmûrê li dijî van êrîşan tu carî serî natewînin. Her wiha KCK'ê li dijî êrîşan banga geşkirina berxwedanê kir.

Komelgeya Demokratîk û Azad a Rojhilatê Kurdistanê (KODAR) jî êrîş şermezar kir û bang li gelê rojhilatê Kurdistanê kir ku li hemberî êrîşan nerazîbûnên tund nîşan bidin.

Bi heman armancê Desteya Rêveber a Tevgera Civaka Demokratîk (TEV-DEM) daxuyaniyek weşand û di serî de gelê bakurê Sûriyeyê bang li gelên Sûriye, Iraq û hemû Rojhilata Navîn kir û mirovahiyê kir ku rabin ser pêyan.

Koma Nifşê Nû ya Parlamentoya Herêmî ya Kurdistanê êrîş şermezar kir û bang li hikûmeta navendî ya Iraqê û Herêma Kurdistanê kir ku li dijî dewleta tirk helwestên xwe nîşan bidin.

Her wiha êrîşa dewleta tirk li Ewropayê jî hat şermezarkirin. Kurdistaniyên li bajarê Nurnbergê yê Almanyayê, bajarên Goteborg, Helsînborg, Gavle û Borlangyê yê Swêdê daketin qadan û dewleta tirk şermezar kirin.

**Divê yekitî were avakirin**

Welatiyên başûrê Kurdistanê jî bertek nîşanî êrîşa dewleta tirk dan û diyar kirin ku Tirkiye pêşengiya dijminahiya gelê kurd dike û gotin ku divê kurd li hemberî êrîşan bibin yek.

Ji aliyê din ve jî li navçeya Sinûnê ya Şengalê bi sedan welatî daketin qadan û êrîş şermezar kirin. *AMED*



## Daxwaza avakirina komîsyonê kirin



Dayikên Şemiyê di hefteya 716'emîn de xwestin çalakiya xwe li qada Galatasarayê li dar bixin, lê polîsan destûr neda. Li ser vê yekê dayikan li ber avahiya Komeleya Mafên Mirovan (ÎHD) çalakiya xwe pêk anî. Parlementera HDP'ê Huda Kaya, lîstikvan Nûr Sure, Yûsûf Çetîn û gelek kes beşdarî çalakiyê bûn. Di çalakiya vê heftê de, ji bo Îbrahîm Demîr ê 36 salî û Agît Akîpa yê 39 salî yên di sala 1991'an de li Hezexa Şirnexê dibin çavan de hatin kuştin û dûre cenazeyên wan hatin dîtin, daxwaza edeletê hat kirin. Zarok û neviyên Akîpa û Demîr jî beşdarî çalakiyê bûbûn. Di çalakiyê de hat gotin ku heta pêkanîna edaletê dê çalakiya xwe bidomînin.

Xizmên Windayan ên Amed û Êlihê jî bi dirûşma 'Bila winda bên dîtin û kujer bên darizandin' çalakiya xwe li dar xist. Di çalakiya Amedê ku ev 514 hefte ye pêk tê de hat xwestin ku Komîsyona Lêkolîna Heqîqetê bê avakirin. Di çalakiya Êlihê ku 420 hefte ye pêk tê de jî çalakvanan aqûbeta Aydin Ay ê di sala 1993'yan de hatibû windakirin pirsî. *AMED - STENBOL*

## Dê colemêrgî dîsa dîrokê binivîsin



Di çarçoveya hilbijartina herêmî de hevseroka HDP'ê Pervîn Buldan û heyeta pê re li Colemêrgê bi gel re hatin gel hev. Buldan li ber avahiya partiya xwe xîtabî gel kir û wiha got: "We bi pêşwaziyeke wisa starta hilbijartinê da. Demek dirêj e gelê Colemêrgê ji bo azadiya gelê kurd berdêlên giran dide. Tu demê li dijî zilmê serê xwe netewandiye û we her dem vê yekê da nîşandan. Di demek wiha ku vîna gelê Colemêrgê girtine bila tu kes neyê ji gelê Colemêrgê dengan nexwaze."

Her wiha di axaftina xwe de Buldan bal kişand ser çalakiya Leyla Guven û êrîşên li ser Mexmûr û Şengalê û ev tişt anî ziman: "Em ê heta dawî piştgiriyê bidin çalakiya Guven û ji bo tecrîda li ser birêz Ocalan bi dawî bibe em ê li ber xwe bidin. Daxwaza Guven daxwaza bi milyonan e. Ji aliyekî din ve jî Mexmûr û Şengal tê bombebarankirin. Divê NY bêdeng nemîne. Em ê bi şev û roj li dijî ev polîtîkayên zilmê bixebitin û serî hildin. Dê Colemêrg dîsa bi sekna xwe dîrokê binivîse." *COLEMÊRG*



## Li Nepalê qeza: Herî kêm 18 kes mirin

**KATMANDÛ -** Li Nepalê otobusa rêwiyan ji rê derket û qeza kir di encama qezayê de hate ragihandin ku herî kêm 18 kes mirine. Hate ragihandin ku otobusa rêwiyan ku herî kêm 40 rêwî tê de bûn li herêma daristan a 35 kîlometre ji paytexta Nepal Katmandûyê dûre ji rê derketiye û di kendalê 400 metreyî de ketiye. Di qezayê de li gorî agahiyên destpêkê 18 kes mirine û 16 kes jî birîndar bûne. Li gorî ajansa nûçeyan a ANI'yê qeza li gorî seat di 17:00'an de pêk hatiye û piştî qezayê seatek û nîv agahî ji qezayê girtine. Li Nepal a ku di cîhanê de cihê herî bilind Everest lê ye bi çiyayên xwe yên bilind tê zanîn. Li welat her sal gelek qezayên trafîkê çêdibin.



# Herêma Kurdistanê di metirsiyê de ye!

Pispora îsraîlî Dr. Ofra Bengio destnîşan kir ku armanca Erdogan ji tehdîd û gefên li dijî YPG'ê, ew e ku Amerîka dest ji alîkarîkirina YPG û kurdên Sûriyeyê berde. Dr. Ofra Bengio got ku êrîşên li ser Şengal û Mexmûrê metirsiyê li Herêma Kurdistanê jî çêdikin

Pispora îsraîlî û endama navenda lêkolînan a Moshe Dayan a zankoya Tel Avîvê Dr. Ofra Bengio, li ser gefên serokomarê Tirkiyeyê Recep Tayyip Erdogan ên li ser rojavayê Kurdistanê û bakurê Sûriyeyê, ji radyoya Dengê Amerîka (VOA) re axivî. Dr. Ofra Bengio wiha got: "Heta niha nayê zanîn Tirkiye dê êrîşî rojhilatê Firatê û hêzên kurd bike yan na. Sê îhtimal hene; yan dê êrîş bike, yan dê wek kartek fişarê li dijî Amerîka bi kar bîne yan jî dixwaze bi vê yekê peyamekê bide cîhan û gelên Tirkiyeyê û dibêje 'em ê wiha li dijî YPG'ê û kurdan şer bikin'."

Dr. Ofra Bengio di berdewamî wiha dibêje: "Lê qesta sereke ya Erdogan ji wan gefan, Amerîka ye. Tirkiye dixwaze bi vî rengî Amerîkayê neçar bike ku dest ji alîkarîkirina YPG û kurdên Sûriyeyê berde. Lê li gorî min Amerîka dê her pişta Tirkiyeyê bigire, ji ber ku di dîrokê de wisa bûye; Amerîka her dem xwe daye kêleka dewletan ne wan yên ku bê dewlet bûne."

Li ser êrîşên Tirkiyeyê yên li ser Şingal û Mexmûrê jî Dr. Ofra Bengio van tiştan tîne ziman: "Ew êrîş nîşan didin ku Herêma Kurdistanê jî di bin metirsiyê de ye. Hûn dizanin, dema DAIŞ'ê êrîşî Herêma Kurdistanê kir û nêzîkî Hewlêrê bû, Herêma Kurdistanê daxwaza alîkariyê ji Tirkiyeyê kir, Tirkiyeyê tiştek nekir! Wê demê jî Tirkiye û Herêma Kurdistanê hevalbendên stratejîk jî bûn!" *QUDS*



# Li Yemenê tevî agirbestê jî şer didome

Hate îdiakirin ku tevî agirbesta li Swêdê ya ji bo bidawîkirina şerê navxweyî yê li Yemenê, şerê li bajarê Hûdeydayê ji nû ve dest pê kir. Li gorî nûçeya ajansa AFP'ê ku agahiyan dispêre welatiyên bajêr, di navbera milîsên Hûsî yên Rabdû Mansûr Hadî û hêzên hikûmetê de dem dem şer diqewime.

Li gorî nûçeyê şer li navenda bajêr û li başûrê bajar çêbûye. Li gorî gotinên welatiyên bajêr li navenda bajarê Hûdeydayê dengê çekan tê bihîstin. Hate ragihandin ku li başûrê Hûdeydayê jî top tên avêtin. Li gorî NY'ê li Yemenê qeyrana herî giran a mirovî tê jiyîn. Şerê di navbera milîsên Hûsî yên şiî û hêzên girêdayî serokê dewletê Abd Rabdo Mansûr Hadî ku Erebistana Siûdî piştgiriyê dike ev 4 sal in didome.



Ji bo bidawîkirina şerê li Yemenê li bajarê Swêdê muzakere dest pê kiribûn û roja pêncşema borî jî agirbest hatibû ragihandin. Piştî ku di meha adara 2015'an de paytext Sana ket destê milîsên Husî şerekî navxweyî rû da û heta niha zêdetirî 10 hezar kes mirine. Di çar salên dawî de ji ber nexweşî û vebayê bi hezaran kes mirin û nîvê gelheya welêt ku 28 milyon e, bi birçîbûnê re rû bi rû ye.

Neteweyên Yekbûyî (NY) ji bo şerê navxweyî yê li Yemenê ku wek 'Qeyrana cîhanê ya herî mezin' tê binavkirin, hê jî pozîsyona xwe ya leşkerî diparêze û bêalî ye. Husiyên ku paytext Sanayê di destê xwe de digirin, li gel Hûdeydeyê, bi rêjeyeke zêde ya bajarên welêt ên rojava ku gelheya zêde li van herêman dijî jî, di bin serweriya xwe de digirin. Yek ji bajarê welêt ê girîng Aden jî sala 2015'an ketibû destê Husiyan lê belê hêzên hikûmeta Yemenê bi piştgiriya hêzên Erebistana Siudî paş ve wergirtibûn. *BRUKSEL*

## Li Fransayê partiyên rastgir ên tundrew geş dibin



Li gorî ankêta dawî ya li Fransayê ya piştî çalakiyên Êlek Zeran partiyên radîkal ên rastgir û alîgirên 'serweriya neteweyî' geş dibin.

Bi çalakiyên Êlek Zeran ên ku ji 17'ê mijdarê û vir ve didomin îmaja 'desthilata dewlemendan' a li ser Emmanuel Macron û partiya wî LREM li nav gel bêhtir tê qebûlkirin. Nav heftiyê li Strasoboûrgê piştî keseki ku tê texmînkirin endamê DAIŞ'ê ye 4 kes kuştin, di nav rastgirên radîkal de zemîna propagandayê geş dibe. Di rewşeke wiha de ku popularîteya Macron ji sedî 20 kêm bûye anketek hat kirin û li gorî vê heke îro hilbijartinek bibe hikûmet û partiyên navendî wê şikestineke giran bijîn.

Li gorî anketa ku şîrketa Ifopê ku beriya hilbijartina gulanê ya Parlamentoya Ewropayê kirî, partiya radîkal a rastgir a bi pêşengiya Yekitiya Neteweyî (RN) ji sedî 24 distîne û LREM ya Macron ji sedî 18 ye. Komarpez ku ji 1958'an ve nêzî 40 sal in li desthilatdariyê man jî tenê ji sedî 11 dengan distîne. Fransa Sernetewîn a bi lîdertiya Jean-Luc Mélenchon ji sedî 9, Partiya Keskan û Ekolojiyê ya Ewropayê ji sedî 8,5, Partiya Sosyalîst ji sedî 4,5 distîne. Tevahiya partiyên çepgir jî ji sedî 25 distînin. *PARÎS*

## Zerîf: Hebûna Îranê di metirsiyê de ye!

Wezîrê derve yê Îranê wekî ku dijberên danûstandina li gel rojava tometbar dikir, aşkera kir ku di vê rewşê de hebûna Îranê di metirsiyê de ye.

Li gorî zanyariyên çapemeniyê wezîrê derve yê Îranê Mihemed Cewad Zerîf di 4'emîn kongreya Partiya Neda ya Îranê de axivî û hişyarî da ku li gel pirsgirêk û milmilaneya di navbera baskên hikûmetê de ku îro hene, cewherê Îranê di metirsiyê de ye.

Ev gotinên wezîrê derve yê Îranê di demeke ku beriya niha jî pêşnimêjên bajarên Tehran û Meşhedê jî bi tundî rexne li siyaseta hikûmetê ya li hemberî rojava kiribûn de pêk hatin.

Rêberê olî yê Îranê Elî Xamaneyî havîna borî bi daxuyaniyekê aşkera gotibû "Rêkeftina atomî xelet bû" û ew bixwe jî beşdar bûye lê berpirsên hikûmetê ew xetên sor ên wî diyar kirine jê derketine.

Beriya niha serokkomarê Îranê Hesen Rûhanî jî ragihandibû ku heta niha herî kêm Amerîkayê 11 caran daxwaza danûstandinê li Îranê kiriye û gotinên wezîrê derve yê Îranê jî di wê çarçoveyê de bûn û rexneyên tund li dijberên danûstanên li gel rojava kir û wiha got: "Ên ku herî zêde dijberên danûstanê ne, rojava wek navenda cîhanê dibînin. Lê divê baş bizanibin guhertinên mezin li cîhanê pêkhatine û divê em jî wan guhertinan nas bikin. Lê hebûna Îranê di metirsiyê de ye."

Mihemed Cewad Zerîf Xamaneyî tometbar kir û wiha got: "Derveyî planên Amerîkayê tu tiştekî din nabînin û rojava û bandora wê nabînin. Li gorî wan li vî welatî çi pêk bê destê Amerîkayê tê de ye." *TAHRAN*

## Li gelek deverên Filistînê pevçûn

**Li gelek deverên Filistînê, herî zêde li bajarê Bîrayê di navbera ciwanên Filistînê û hêzên Îsraîlê de şer û pevçûn rû dan. Di şer de Mihemed Nexlê yê 18 salî ku bi guleya hêzên Îsraîlê birîndar bûbû jiyana xwe ji dest da.**

**Heyva Sor a Filistînê diyar kir ku Hêzên Îsraîlê li benda kontrolê ya bakurê bajarê Bîrayê gule berdane wesayîta ambulansê.**

**Nûçegihanê ajansa Hawarê ji Gazzeyê ragihand ku li dirêjahiya xeta sînor pevçûnên giran di navbera ciwanên Filistînê û hêzên Îsraîlê de rû dan, di encamê de 75 welatiyên Filistînê, 7 xebatkarên tenduristiyê û 3 rojnamevan bi guleyan birîndar bûn. Çavkaniyên herêmî jî dan zanîn ku li gundê Mexîr ê rojhilatê bajarê Ramelayî Hêzên Îsraîlê êrîşî çalakgeran kirin, 2 welatiyên Filistînê bi guleyên plastîkî birîndar bûn.**

**Hat ragihandin ku pevçûnên herî dijwar li bajarê Nablusê rû dane û hat diyarkirin ku hêzên Îsraîlê dev ji çalakiya aştiyane ya welatiyên Filistînê wer dan. Li vir jî du welatî birîndar bûn. Li rawestgeha Zatera ya başûrê Nablusê îsraîliyan êrîşî wesayîtên welatiyên Filistînê kir, di encam de hejmarek filistînî birîndar bû, her wiha di pevçûnên li gundê Leben ê rojhilatê Nablusê de welatiyek filistînî bi guleya plastîk birîndar bûye.**

**Li herêma Bab Zawiya ya navenda bajarê Xelîl jî di êrîşa hêzên Îsraîlê ya li dijî çalakiyên ciwanên filistînî 4 welatî birîndar bûn.** *XEZA*



www.arsivakurd.org




## Karkerê flormarî karkerê Novamedî taqîp kenî

**STENBOL –** Zafê înan karkerê cinî ke fabrîkaya Flormarî ya Gebze de xebetîyayêne aşma gulane de bi mehneya fîrmayê Sendîka Petrol-Îşî de xo rêxistin kerdî, kar ra ameyî eştiş. Dima ra karkerî dest bi xoverdayîş kerdî û çalakîya înan roja 2015. de dewam kena. Karkeran ra Şukran Akyildiz û Nurhan Gulere qisey kerdî û dîyar kerdî ke ê do heta peynî xover bidî. Çalakgerê flormarî xoverdayîşê 81 cinîyê ke fîrmayê Novamedî de 12 serrî verê cû çalakî dabî dest pêkerdiş û 448. rojan çalakîya cinîyan dewam kerdî ardî vîr.



# PAJK: Tirkîye do cewabê xo bigîra

Koordînasyonê PAJKî hêrişê Tirkîye yê hemverê Mexmûr, Şengal û Rojava şermezar kerd û va: "Rejimo faşîst do bi hawayêkê tewr xurtî cewabê nê hêrişan bigîro. Ganî T.C bizano ke do hêrişî bêcewab nêmanê. Nê şarî her tim cewabê rejimanê kolonyalîst û faşîstan dayo û do bido."

Dewleta tirkî perê kampa Şehîd Rustem Cûdîyî ya Mexmûrî ke binê pawitişê Neteweyê Yewbîyayeyî de ya bombardûman kerd. Netîceyê bombardûmanî de 4 sivîlî şehîd bîyî. Perê 4 cinîyê sivîlî ameyî qetilkerdene, Mexmûr de şar bi sloganê 'Erdogano kiştoxo' cayê merasîma cenaze de ame pêser. Koordînasyonê Partîya Azadîya Cinîyanê Kurdistanî (PAJK) hêrişê artêşa Tirkîye yê 13ê Kanûne bi eşkerayîyêka nûştekîye şermezar kerd.

Eşkerayîye de nê ameyî vatene: "Hêrişê hêzanê faşîst û kolonyalîstan ê T.Cyî de Mexmûr de 4 sivîlî ameyî qetilkerdene. Sere de serreyê şarê ma yê kampa Ş. Rustem Cûdî ya Mexmûrî serreyê hemeyê şarê ma weş bo. Şarê ma yo welatperwer ê Mexmûrî serra 1994 ra nata çirey çok nênayo ro û do tîya ra tepîya zî mucadeleyê xotim xurt bikero. Şarê ma do bi wayîrvejîyayîşê şehîdanê xo cewabê tewr raştî bidê. Ganî T.C bizano ke do hêrişê ci bêcewab nêmanê. Nê şarî her tim cewabê rejimanê kolonyalîst û faşîstan dayo û do tîya tepîya zî bidê."




Dewamê eşkerayîye de wina ame vatiş: "Seke aseno serekçete Erdogan û çeteyê AKP-MHPyî tu çîyêk ke Kurdan xo rê awan kerdê rê tehemul nêkenê. Gama Kurd û Kurdistan vajîyeno Erdogan û çeteyê ci adeta gêj benê. Rejimo kolonyalîst ê Tirkî her firsend de hêzanê mîyanneteweyîyan ra zî paştî gêno û bi hawayêkê wehşîyî hêrişê Kurdan keno. Şarê Kurdistanî yê ke bi roşinê felsefeya rayber Apoyî adeta bîyî roşinvîr bi şorişê Rojava hîna zaf bîyî hedefê çeteyanê AKP-MHPyî. Na yewe ra ma veng danê her kesî ke hemverê organîzasyonê çeteyî yê AKPyî de mucadele bidê. Tirkîye de teberê mucadeleyêkê şorişî yê hempar û yewî de tu rayîrêk do raşt û neticegirewtox nêbo. Kişta nê de bêvengmendîşê NY û hukmatê merkezî yê Iraqî yê hemverê hêrişanê dewleta Tirkî zî nêno qebûlkerdene."

**Hêriş zihîfîya Erdoganî yo**

Eşkerayîye wina peynî bî: "Peynî de ma vanê ke do şarê ma cewabê hêrişanê rejimê faşîstî yê Tirkî yê hemverê Mexmûr, Şengal û Rojava bi hawayêkê tewr xurtî bido. Ma nê hêrişan sey zihîfîya AKP û Erdoganî vînenê. Dîktatoro ke serê sivîlan de bombayan varneno do wijdanê merdimîye de bêro muhakemekerdene û do têgêrayîşê cinîya azade zî hesabê nê hêrişan biperso. Tu hêrişêk do bêcewab nêmano. Kurdistan de dewrê îdareyanê xerîb û îşxalkaran qedîyayo. Wextê şîyayîşê çeteyanê Tirkî yê faşîst û kolonyalîstan zî ameyo. Çunke wisarê cinîyan û şaran ameyo." ***BEHDÎNAN***


# Hêriş netîceyê hemkarîya leymine de virazîya



Dewleta Tirkîye ya îşxalkare perey hemverê Mexmûr û Şengalî de hêrişo hewayî viraşt. Bombardûmanê teyareyanê şerî yê Tirkî de 4 cinîyî ameyî qetilkerdene. Farîsogullariyî gefê Erdoganî yê hemverê Kurdan ard vîrî û wina vat: "Dimayê gefanê Erdoganî ra hêrişî virazîyayî. Netîceyê bombardûmanî de 4 hemwelatijê ma şehîd kewtî. Her kes zano ke Kampa Mexmûrî binê kontrolê NYyî de ya."

Farîsogullariyî ard vîrî ke şarê Mexmûrî 24 serrî yê raştê zextanê PDK û dewleta Tirkî yenê û qiseykerdişê xo wina da dewamkerdene: "PDK û dewleta Tirkî tim Mexmûr xo rê hedef girewt. Serra 1998î ra nata Mexmûr binê kontrolê Neteweyê Yewbîyayî de yo la ancî zî çende reyan raştê hêrişan amî. Tirkîye sînorê Iraqî ra ravêrena û hêrişê kampe kena. Par zî 6ê na menge de hêriş amebi kerdene û 5 hemwelatijanê ma cuya xo vîndî kerdebî. Kampe kontrolê NY, Iraq û Hukmatê Başûrî de ya. Nê hêrişî bi hemkarîyêka leymine ameyê viraştene. Ma veng danê hemeyê rayapêroyîye û saziyanê mîyanneteweyîyan ke hemverê nê hêrişanê wehşîyan ê dewleta Tirkîye de vejîyê. Ganî Başûrê Kurdistanî zî bêvengîya xo xira bikero û ercanê xo yê neteweyîyan rê wayîr vejîyo." ***AMED***

# 20 nuqteyê cigêrayîşî estî



Mabenê Colemêrg û Wanî de kîşta nuqteyanê cigêrayîşî yê dekewtiş û vejîyayîşê Depîn, Kirikdag, Yenîkopru û Elbakî de cayanê sey Bebleşîn, Albayrak, Hoşap, Zernek, çatrayîrê Payîzava-Wanî û Kurubaş de zî xeylî nuqteyê cigêrayîşî estê. Hemwelatijî her nuqteya cigêrayîşî de bi saetan yenê vindartene.

Mîyanê Stenbol û Erzeromî 2 hezar kîlometre yo û tu nuqteyêka cigêrayîşî çinya, la mîyanê Colemêrg û Wanî de 20 ra vêşêr nuqteyê cigêrayîşî estê. Nuqteyan de ge-ge bi kîlometreyan rêze virazêna. Rêzanê wesayîtan ê dergan de ambulansî zî yenê vindarnayene. Xusûsen nuqteya eskerîye ya Yenîkopru ke hîrêgoşeyê Wan-Colemêrg-Gewerî de ya û nuqteyanê Bableşîn û Hoşapî ke mîyanê Payîzava-Elbakî de yê hemwelatijî heta nîmeyê şewe zî yenê vindarnayene.

**Rayîrê 3 saetê bena 12 saet**

Hemwelatijêk ke mabenê Colemêrg û Wanî de raywanîye keno qisey kerd û va: "Ma rayîrê mîyanê Wan-Colemêrgî ra vanê 'rayîrê îşkenceyî.' Çunke nê rayîrî de her tewir zehmetî esta. Dewlete ser de zî roj bi roje hûmara nê nuqteyan hîna kena vêşî. Eşyayanê ma yew bi yew danê têro. Wina aseno ke dewlete ma ra zaf tersena. Eke nêtersayêne hende cigêrayîşî nêkerdêne." ***WAN***

# Bêîxmalîya Barajê Dîcle



Badê ke qezaya Gêl ya Amedî de qapaxêko Barajê Dîcle şikîya awa Çemê Dîcle 6 metreyan berz bî. Hedîse ra dima xeylê Baxçeyê Hevselî û erdê berardişî binê ame de mendî. Sewbîna tay cayan de awe resa heta keyeyanê hemwelatîyan û dormeyê Pirê Des Berî yê Amedî de kargehî binê awe de mendî. Ebrzbîyayîşê peymeyê awe vera xeylê heywanî awe de şîyî û xeylê mase zî merdî. Ame zanayene ke do roja yewşeme 270 mîlyon metrekup awe bêro tehlîyekerdiş. Derheqê babete de Hemserekê Şûbeyê Odeya Muhendisanê Înşaetî (ÎMO) yê Amedî Nîhat Noyanî qisey kerd.

Nîhat Noyanî qiseykerdişê xo de bale ante texrîbatan ser û va: "Baraj de muhendis çin bî û tena wezîfedarî estbî. Destûr nêdayî kem a cayê hedîse ra dîmenan bigîrî. Qapaxê bajajî teqîya. Ma waşt ke qapax padî, la reyna teqa. Hetê Fîskaya binê awe de mend. Baxçeyê Hevselî de texrîbatê zêde estî. Bajarê Amed hetê ekonomî de baş nîyo. Ganî texrîbat bêrî tespîtkerdiş û tazmînat bidîyo hemwelatîyan. Beno ke qapaxê binî zî biteqî." ***AMED***



Seba mîtîngê Amed veng ame kerdiş

# KESK seba mîtîngî veng da

Konfederasyonê Sendîkaya Kedkaranê Rayapêroyî (KESK) hemverê krîzê ekonomî, betalî û binpaykerdişan de bi siloganê 'Bedêlê krîzî kedkar nê, wa kesî ke bîyî sebeb bidî' do 16ê kanûne de Raşteyê Îstansyonî yê Amedî de mîtîng pê bîyaro. Yeno pawitiş ke Sêrt, Êlih, Wan, Riha, Bedlîs, Dêrsim, Semsur, Şirnex, Elezîz, Muş, Mêrdîn û Çewlîkî ra xeylê kesî seba tewrbîyayîşê mîtîngî bêrî Amed. Cinîyê KESKî seba terbîyayîşê mîtîngî veng dayî.

Derheqê babete de Sekretera Cinîyan ya Sendîkaya Kedkaranê Bûroyî (BES) ya Amedî Serap Kiliç, Hemsereka Sendîkaya Kedkaranê Xizmetê Sosyal û Weşîye (SES)ya Amedî Gonul Adibellî û Sekretera Cinîyan ya Hûmara 1. ya Egîtîm Senî ya Amedî Zeynep Aykate qisey kerdî.

Cinîyî qiseykerdişê xo de wina vatî: "Mîtîng bi ortaxîya DÎSK, TMMOB, TTB û rêxistinê ked û pîşeyî do pê bêro. Ma do mehverê butçeya şer û rantî de vengê xo berz bikerî. Talebê ma meşru û heq î. Krîz û enflasyonê berzî de heqê ma ameyî binpaykerdiş. Ganî vînîkerdişê ma tepîya bêrî herînayîş. Hewl dîyeno ke cinîyan hepsê keyeyan bikerî. Hedefê înan oyo ke cinîyan heme raşteyê karî ra dûrî bikerî. Kesê ke tewr zêde keda înan yena binpaykerdiş cinîyî û ganî taybet cinî raşteyê mîtîngî de cayê xo bigîrî." ***AMED***




Konfederasyonê Sendîkaya Kedkaranê Rayapêroyî (KESK) ewro bajarê Amedî de do bi siloganê 'Hemverê feqîrî, betalî û bêasayîşî de têkoşîn' Raşteyê Îstasyonê yê Amedî de mîtîng pê bîyaro. Mîtîngê Herêmî do Îzmîr, Stenbol, Amed, Wan, Bedlîs, Xerpît, Meletî, Dersim, Semsûr, Riha, Êlih, Mêrdîn û Şirnexî de zî bêrî viraştiş. Endamê Komîteya Amadekarî yê Mîtîng û Hemserekê Şûbeyê Hûmara 3. ya Egîtîm Senî yê Amedî Abbas Şahînî seba tewrbîyayîşê mîtîngî veng da.

Şahînî vengdayîşê mîtîngî de wina va: "Krîzê ekonomî tewr zêde kedkaran ser de tesîr virazeno. Tarîx timî xo dibare keno. Butçeya şer bî sebebê çinbîyayîşê împaratorîya osmanîyan. Nika zî wina yeno kerdiş. Huqûq û demokrasî raşte ra wedarîya yî. Krîzê ekonomî prosesê osmanîyan de wextê îstîbdatî de vejîya raşte. Prosesê îqtîdarîyê AKPyî de zî, şert ûmercê faşîzmî de krîzê ekonomî vejîya raşte. Netîceyê polîtîkayanê şerî de krîz vejîya raşte. Ma veng danê heme kesan ke tewrê mîtîngî bibî." ***AMED***

# Îranî di kolberê bînî zî qetil kerd


Goreyê xebera Rojnewsî şaristananê Pîranşar û Bane yê Rojhilatê de hêzanê Îranî vizêr saetanê şanî de bi sîlehan hêrişê kolberan kerd. Hêriş de 2 kolberî ameyî kiştene, 2 kolberî zî birîndar bîyî.

Nasnameyê kesanê ke qewimîyayîşê de cuya xo vîndî kerda sey Hasil Badberîn (16) ke dewa Durkesê yê Pîranşarî ra yo û Rehman Seîd ke (45) dewa Selmanî yê Bane ra yo ameyî eşkerakerdene. Ame zanayene ke kolberê bi nameyê Îbrahîm Elî (50) û Mihemed Bijîr (15) zî birîndar bîyê. ***TEHRAN***

www.arsivakurdi.org

# Polîtîkaya kurd-kuj a dewletê

**Feraseta kurd-kuj ji avakirina Komara Tirkiyeyê ve li ser kar e û heta niha li Kurdistanê bi sedan komkujî pêk anîne. Ne tenê li bakurê Kurdistanê li çar parçeyên Kurdistan û Ewropayê jî kurdan hedef digirin**



ROHAT ARARAT

Di 22'yê cotmeya 1993'yan de Serfermandarê Cendirmeyan ê Herêma Amedê Bahtiyar Aydin di nava leşkeriyê de li ber avahiya Fermandariya Asayîşê ya Licê bi awayekî guman hat kuştin. Serfermandariya Giştî ya Artêşa Tirk wekî ku kuştina Bahtiyar Aydin ji aliyê PKK'ê ve pêk hatibe ragihand. Di gelek lêpirsînên der barê çete û îtirafkarên demê de derket holê ku Aydin ji aliyê JÎTEM'ê ve hatiye kuştin. Di necama lêpirsîna doza Ergenekonê de Şemdîn Sakikê îtirafkar jî di îfadeyên xwe de gotibû; "Leşkerekî Bahtiyar Aydin kuştiye û leşkerekî din jî ew leşkerê ku Aydin kuştiye, kuştiye".

Beriya kuştina Bahtiyar Aydin, bi awayekî guman balafira ku Serfermandarê Cendirmeyan ê Giştî Eşref Bîtlîs tê de di 17'ê sibata 1993'yan de bi awayekî guman ketibû û di encama ketinê de Bîtlîs miribû. Dîsa serokkomarê demê Turgut Ozal bi awayekî guman miribû. Her wiha piştî mirina Bîtlîs, Bahtiyar Aydın, Ridvan Ozden û çend leşkerên din ên di ekîba Bîtlîs de jî hatin kuştin. Sedemên ev mirinên bi guman çi bû û dê rê li ber çi vekirina û pê ve girêdayî kê ferman komkujiya Licê da û ev mijar hemû çawa pêş ketin? Em ê hewl bidin hinekî vê mijarê ji hev veçirînin.

Beriya ku Eşref Bîtlîs bê kuştin bi 7 mehan ji serokkomarê demê Turgut Ozal re nameyek dinivîse û di nameya xwe de dibêje; 'Birêz serokkomarê min, lazim e hûn bi xwe daxilî vê mijarê bibin, nexwe em ê bi xeterî û rîskên gelekî mezin re û rû bi rû bimînin' û bi vê yekê dixwaze bi PKK'ê re lihevkirin pêk were. Ozal li ser plana çareseriya pirsgirêka kurd disekine û piştî vê nameyê jî du caran bi Eşref Bîtlîs re dicive. Ozal piştî hevdîtina bi Bîtlîs re vê mijarê dixe rojeva dewletê û bi serokwezîrê demê Suleyman Demîrel û Dogan Gureş re nîqaş dike. Piştre jî mijar tînin rojeva Civîna MGK'ê û di civînên MGK'ê de li gorî xwe plansaziyek dertê holê. Di heman demê de serokkomarê tirk Turgut Ozal di ser Celal Talabanî re bi Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan re hin têkiliyan datîne. Hin heyet diçin û tên.

Di sala 1991'an de Partiya Kedê ya Gelan (HEP) bi tifaqa SHP'ê wekîlên xwe şandin meclisa Tirkiyeyê. Di heman salê de serokkomar Turgut Ozal bi hevdîtineke li Enqereyê ya bi Celal Talabanî re rêya hevdîtinên bi PKK'ê re vekir. Piştî vê hevdîtinê Ozal aşkera kiribû ku di hişê wî de ji bo kurdan modela federasyonê û efûya giştî heye. Piştre Talabanî jî ragindibû ku Ozal gotiye dê; "Xweseriyê bidin kurdan".

**Çareserî û komkujî**

Di 3'yê adara 1992'yan de Ozal plana xwe ya çereseriya pirsgirêka kurd û bi hûrguliyên wê tîne rojeva MGK'ê. Piştî civînê bi hefteyekê jî li Koşka Çankayayê bi parlementerên kurd Ahmet Turk, Sirri Sakik û Orhan Dogan re hevdîtinekê dike û ji wan re dibêje "Ez ê vê pirsgirêkê ji binî ve çareser bikim". Lê di heman salê de li bakurê Kurdistanê ji ber destûrnedayîna pîrozbahiyên Newrozê hêzên dewletê gule li welatiyan reşandin û di encamê de li gorî daneyên dewletê li Şirnexê 52, Cizîr 10, Nisêbîn 14, Kerçews û Geverê jî 3 welatî hatin qetilkirin. Lê belê hejmara rast zêdetirî van daneyên dewletê ye.

**Çima balafira Bîtlîs hat xistin?**

Ev hewildanên Ozal û Bîtlîs di nav dewlet û leşkeriyê de rastî bertekên tund hatin. Ev hewildanên Ozal û Bîtlîs ên plansaziya pirsgirêka kurd ji aliyê hêzên derve jî ji nêz ve dihatin şopandin. Bîtlîs dema ku bi helîkopterê diçû Hewlêrê jî balafira wî rastî êrîşeke tacizî hat. Lê belê dewleta kûr dev jê berneda. Di 17'ê sibata 1993'yan de bi awayekî guman balafira ku Serfermandarê Cendirmeyan ê Giştî Eşref Bîtlîs tê de ya bi tîpa Beechcraft B200 Kîng Aîr ketibû û di encamê de Bîtlîs miribû. Serfermandariya Giştî ya Artêşa Tirk vê bûyerê wekî qezayê ragihand lê rapora wê jî bi tu awayî nehat parvekirin.

**Piştî Bîtlîs Ozal jî kuştin**

Bêguman dewleta kûr a bi şer xwe li ser pêyan dihêle dixwest rê li ber çareserkirina pirsgirêka kurd bigire. Bi kuştina Bîtlîs, di heman demê de xwestin peyamekê bidin Turgut Ozal jî. Lê belê Ozalê ku hewildanên xwe yên çareseriyê berdewam kirin, di 17'ê nîsana 1993'yan de ew jî bi awayekî bi guman jiyana xwe ji dest da. Mirina Ozal jî wekî ya Bîtlîs ji aliyê dewleta kûr ve pêk hatibû. Birayê Ozal, Korkut Ozal piştî salan gotibû,'Gumana min di vî warî de tune ye ku birayê min hat kuştin. Birayê min hat jehrîkirin û kuştin.'Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan jî li ser vê yekê dibêje; 'Cara yekem min aşkera kir ku Ozal hatiye kuştin. Lewra roja kuştina Ozal, di heman demê de roja ku dê bi min re hevdîtin pêk bianiya bû. Ango heke du rojên din jî sax bimana dê hevdîtin bi pêş biketana, ev gelekî girîng e…' Bêguman ev kuştin kevneşopiyeke dewleta tirk e. Ev kevneşopî destûra serkeftinê nade kesê. Di salên cuda de kesên wekî Erbakan û Ecevît jî tasfiye kirin.

**Aydin û şewitandina Licê**

Belê dewleta kûr yek bi yek kesên bi aweyekî dixwestin li gorî xwe pirsgirêka kurd çareser bikin tasfiye dikirin û li Kurdistanê komkujî dikirin. Bahtiyar Aydin jî di ew ekîba Eşref Bîtlîs de bû û li herêmê bi kesayeta xwe ya 'Nêzî gel û li dijî tundiya derqanûnî' dihat naskirin. Piştî kuştina Bahtiyar Aydin a di 22'yê cotmeha 1993'yan li ser fermana Fermandarê Alaya Cendirmeyan ê Amedê Serheng Eşref Hatîpoglu bi hinceta kuştina Bahtiyar Aydin leşker û polîsan li navçeya Licê ya Amedê ketober welatî gulebaran kirin. Di vê êrîşê de bi dehan welatiyan jiyana xwe ji dest da û bi dehan welatî jî birîndar bûn. Her wiha gelek mal hatin şewitandin. Lê dewletê wekî ku tenê 16 welatiyan jiyana xwe ji dest dabe û 36 welatî jî birîndar bûbin ragihand. Ew xeteriyên ku Eşref Bîtlîs bal dikişand ser, êdî yek bi yek pêk dihatin. Di bin navê JÎTEM'ê de bi hezaran welatî hatin qetilkirin. Her wiha bi hezaran gund hatin şewitandin. Şewata Licê jî yek ji wan bû.

**Kujer beraet kir, Ozkan girtî ye**

Piştî vê êrîşê bi hinceta Bahtiyar Aydin kuştiye welatiyê bi navê Mehemet Emîn Ozkan hat girtin û darizandin. Her çend Ozkan di dema darizandinê de gotibû tu eleqeya wî bi bûyerê re tune ye lê dîsa jî cezayê muebeta giran lê hat birîn. Li aliyê din jî mexdûrên komkujiya Licê der barê buyerê de doz vekirin. Ev doza ku di nav civakê de wekî Doza Licê jî dihat zanîn wekî bersûc Fermandarê Alaya Cendirmeyan ê Amedê Serheng Eşref Hatîpoglu û fermandar Tunay Yanardag dihatin darizandin.

Doza Licê li Amedê dest pê kir û bi hinceta ewlethiyê li Eskişehîr û Îzmîrê hat dîtin. Herî dawî di 7'ê kanûna 2018'an di danişîna biryardayînê ya dozê de Dadgeha Cezayê Giran a 1'ê ya Îzmîrê biryar da. Heyeta dadgehê ji ber bersûcê Fermandar Tunay Yanardag miriye biryar da ku Yanardag ji dosyayê bê derxistin û der barê bersûc Fermandarê Cendirmeyan ê wê demê Eşref Hatîpoglu de jî biryara beraetê da. Lê belê welatiyê bi navê M. Emîn Ozkanê ku bêsûc û bêguneh rastî cezayê giran ê muebetê hat û tevî temenê xwe yê 80 salî û gelek nexweşiyên xwe jî di zindanê de ye.

Ozkan di nav lîsteya girtiyên nexweş ên rewşa wan giran a Komeleya Mafên Mirovan (ÎHD) de cih digire. Nexweşîna guatr, roviyan, dil, tansiyona zêde, alzheîmer lê peyda bûne. Heta niha di girtîgehê de 5 caran qeyrana dil derbas kiriye û 4 caran jî anjiyo bûye. Divê ji ber guatra xirab a qirika xwe emeliyat bibe lê belê ji ber temenê wî zêde ye nikare bibe. Carnan Ozkan ji ser hişê xwe diçe û her du guhên wî baş nabihîzin. Heta niha ji bo bê berdan malbatê 5 caran serî li Saziya Tiba Edlî (ATK) daye û saziyê rapora ji sedî 87 daye wî lê dîsa jî tê gotin "dikare di girtîgehê de bimîne" û nayê berdan.

**Dewleta kûr aşkera bû**

Ev bêdadiya dewleta tirk a li dijî kurdan bi awayekî vekirî radixe berçavan. Biryara beraet ya ji bo bersûcê dozê ne biryareke hiqûqî û wijdanî ye. Ew dewlat kûr a ku di salên 90'î de bi awayekî veşarî mirov dikuştin di encama berxwedan û têkoşîna gelê kurd û Tevgera Azadiya Kurdistanê ku hat aşkerakirin niha jî bi awayekî vekirî mirovan dikujin û komkujiyan dikin. Dijminatiyeke aşkera li dijî gelê kurd dimeşînin. Ew hêzên tarî ên ku kesên di nav dewletê de çareserî dixwestin kuştin, Licê şewitandin, bi hezaran kurdên bi rûmet, siyasetmedar û di nav de karsazên kurd jî hebû kuştin di salên dawî de bi nasnameyeke aşkera li ber çavên cîhanê komkujiyê mizin pêk anîn. Komkujiyên li Sûr, Cizîr, Nisêbîn, Şirnex, Gever, Hezex û hwd. berhema hişmendiya kurd-kuj a ji salên 90'î ve tê û îro jî li ser kar e.

Ev feraseta kurd-kuj ji avakirina Komara Tirkiyeyê ve li ser kar e û heta niha li Kurdistanê bi sedan komkujî pêk anîne. Ne tenê li bakurê Kurdistanê li çar parçayên Kurdistanê û li Ewropayê jî komkujî pêk anîne. Di vir de mirov lazim e ji kurdên xwe bi dewlet û desthilatiya kujer ve girêdidin re tişteki bibêje; 'Nebin evîndarê celadê xwe dê rojekê ew celad ango kujer we bikuje.' Dema ku we bikuje jî li rondikên çavên we nanihêre.

Niha jî em di pêvajoyeke ji salên 90'î dijwartir de derbas dibin. Lewra jî her kurd hişê xwe bide serê xwe û ev kiryarên dewletê, bêdadiya li dijî kurdan û ew polîtîkaya kurd-kuj a dewletê baş bibîne. Heke ev xeterî neyê dîtin dê bi hezaran kurdên din jî bên kuştin, bi dehan bajarên din ên Kurdisanê jî bên şewitandin û bêhiqûqiya li Licê her berdewam bike.




## Rapora ANAP'ê

Ozal ji bo amadekirina raporekê parlamenterê ANAP'ê Adnan Kahvecî erkdar dike. Kahvecî piştî ku demekê li bakurê Kurdisanê digere û lêkolînan dike bi sernavê "Pirsgirêka Kurd dê çawa çareser bibe?" raporekê amade dike. Kahvecî yê ku di rapora xwe ya pêşkêşî Ozal dike de ev tişt bala mirovan dikişîne: "Bi rêbazê leşkerî tu welatek negihiştiye encamekê. Îro pirsgirêka kurd jî veguheriye qeyraneke siyasî. Ji bo çareserkirinê jî pêwîstî bi gavavêtinên wêrekî yên siyasî heye. Ji ber vê yekê jî pêwîst e realîteya kurd, nasnameya kurd û zimanê kurd bi lezgînî bê qebûlkirin û mafên wan ên siyasî bên dayîn…" piştî vê raporê bi salekê Kahvecî di encama qezaya trafîkê ya bi guman jiyana xwe ji dest da. Piştre ev jî wekî kiryarên dewleta kûr aşkera bû.

Piştî vê rapora Adnan Kahvecî, di 27'ê tebaxa 1992'yan de di civîna MGK'ê de hat nîqaşkirin. Di civînê de Ozal parast ku di TRT GAP'ê de weşana kurdî pêk bê û got ku pêwîst e perwerdeya bi zimanê kurdî pêş bikeve. Ozal her wiha aşkera kiribû ku çi dibe bila bibe ew alîgirê nîqaşkirina modela federasyonê ye. Lê belê li aliyekî din jî li tevahiya bakurê Kurdistanê komkujî dihatin kirin. Di vê pêvajoyê de nivîskar rewşenbîr û rojnameger Musa Anter di 20'ê îlona 1992'yan li Amedê ji aliyê JÎTEM'ê ve hat qetilkirin. Her wiha bi hezaran kuştinên din pêk hatin.